Di wê demê de wê mirov dibînê ku wê, weke aliyekê giring wê, xwe bide dîyarkirin ku wê rewşa felsefeyê wê çerçoveyên olî wê bi wê re wê werê kirin. Felsefe wê bi awayekê wê weke şewayekê hizirkirinê ê ku ew hatî xistin xizmeta olê û pêşketina wê de jî bê. Wê, di aslê xwe de wê, di wê çerçoveyê de wê, felsefe wê, di serî de wê serdemên navîn de wê armanca xwe ya ku wê bi derxistina mirov weke kirdeya navendî a aqil wê, ji wê dûrkeve.

Her çendî ku wê wê rewş wê ev jî bê lê wê di aslê xwe de wê hewldanên derketinê nû ên felsefîkî wê bidina ber xwe. Wê bikin ku ew derkevin. Şewayên şîrovekirinê ên weke hanakîrîna û rexnekirinê wê hin bi hin wê bi demê re wê pêşkevin. Di pêvajoya pêşî a serdemên navîn de wê, pêvajoya ku wê bi navê *patristiskê* wê weke pêvajoya berî skolastîkê ku wê pêşkeve wê, weke pêvajoyeka ku wê di çerçoveya olî de wê, şîrovekirina hizrên berê û li gorî wan pêşxistina hizrên olî jî wê weke demek wê bê.

Felsefeya serdemên navîn wê, di aslê xwe de wê, weke felsefeyeka ku wê weke ku me hinekî li jor hanî li ser ziman wê, temenê wê li ser gotina 'felsefeyê' a bi karhanîna wê bo pêşketina wê ya di serdemên navîn de wê, xwediyê temenekê felsefîkî a ji serdemên kevnera bê. Ji sê aliyên ve wê li ser temenê serdemên kevnera mirov dikarê wê hilde li dest, şîrovebikê û wê werênê li ser ziman. Aliyê pêşî wê bi şîrove û hewldana fahmkirina li gorî demê a felsefeyên serdemên kevnera bê. Aliyê duyem wê, bi rengê felsefîkî wê weke ku mirov bi Augustinus re wê dibînê wê, hewlbêdayîn ku wê têgîna gûmanbarîyê wê ji nava felsefeyê wê were derxistin û wê li ser wê re wê temenê pêşxistin û bawerîyê wê were pêşxistin. Di wê rengê û awayê de wê, di aslê xwe de wê, mirov dikarê wê, weke aliyekê ku wê, felsefe wê, weke şewayekê hizir ê li gorî demê weke ku ew bi hevdû re di ahengekê de pêşdikeve wê, bide dîyarkirin. Aliyê din ê sêyem jî wê, bi felsefîkî wê, temenê wê bi olzanî wê biafirê û wê bê hanîn li ser ziman. Di rengê de wê, felsefeya



serdemên navîn ji aliyê fahmkirina navarokê ve jî wê ji du aliyan ve bi temen wê hilde li dest û wê fahmbikê. Yek wê, olzanî wê, weke felsefeyê wê pêşkeve û wê çerçoveya wê bide diyarkirin bê. Ya din a duyem jî wê gotina 'xwûdê' wê weke navendek têngîhî a felsefikî ku wê li dora wê were hizirkiirn û wê bê hanîn li ser ziman. Têgîneka xwûdê ku wê mantiqê wê, bi felsefeyên weke ya 'parmenides û hwd re wê were li ser ziman wê li ser esasê tekîtiyê wê were hanîn li ser ziman. Wê li ser wê tekîtiyê re wê hizrek yekîti wê temenê wê di ahengekê olzanîyî de wê bê afirandin û pêşxistin. Pêşxistina felsefeyê wê, di wê rengê de wê, weke hizirkirina bi olî re bê. Wê felsefe wê li ser esasê bi temen û watekirina têngînên olî û hanîna wan li ser ziman bi temen, bingihe û dîrokek olzanîyî re wê, xwediyê temenê fahmkirinê bê. Di wê çerçoveyê de wê, felsefeya serdemên navîn wê, armanc, bawerî û wahi wê weke temenê wê yê olî ên ku wê bi wan wê were hizirkirin bê. Di wê rewşê de wê, di serî de wê, weke aliyekê giring wê mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê, ji serdemên sedsale 7' min û pê de wê, li herêmê wî xate olên semewî wê, hin bi hin wê pêşî bi cihutiye û piştîre bi mesihiyê re wê hin bi hin wê pêşkeve û wê bi temen bibê. Piştîre wê, îslam wê were û tevî wan bibê. Wê, di çerçoveya têngîn, gelemperî, bawerî, aqil, dîrok û fahmkirina wan de wê, dem wê hin bi hin wê, pêşxistin.

Di nava hizirkirina felsefeyê de wê, ew wê di serdemên kevnera wê pêşkeve ku wê hizrên gelemper ên felsefikî wê pêşkevin. Di wê çerçoveyê de wê, têngînên bawerî wê hin bi hin wê pêşkevin. Wê li dunyayê wê ti yazdanên li ser rûyê ardê wê nemênin. Wê hemû wê hebûnek xwûdanî ku wê, heya lê ew ser hemû tiştî re ya û ew baxtê hemû tiştî dide diyarkirin wê, bi wê re wê, pêşkeve. Di aslê xwe de em dema ku em li lîteratura zimanî a serdemên navîn binerin em wê dikarin bêjin ku wê bi gotin û wateyên demên serdema kevnera bê. Wê, di wê çerçoveyê de wê ziman, mantiqê, felsefe, axlaq, têngihiştin, hişmendî û hwd wê bi hemû aliyên din re wê, temenê wê di wan demên berê de wê were avêtin. Minaq wê, têngînên weke yên bawerîyî û şîrovekirinên wê bi felsefikî û gihiştina encamên weke têngînên pêwîstîniyê û hwd wê, piştîre wê, di olê de wê ew pêwîstîni wê weke baxt wê were şîrovekirin û bê hanîn li ser ziman.

Di wê warê de wê di felsefeya serdemên navîn de wê, weke ku wê çawa wê felsefe wê bê kirin û wê hebûn û tişt wê, were şîrivekiirn û hewlbê dayîn ku ew were ispatkirin ku ew heya û ankû nîn a, û ku ew hebê ew çawa heya û hwd wê, bi felsefikî wê, were li ser ziman. Minaq

Thomasê Auqinayî wê, di wê warê de wê dema ku mirov wî dixwênê wê, bi heman rengê wê, hewlbide ku ew hebûna xwûdê weke hebûnek heyî a dîyarde wê çawa wê ispatbikê wê li ser wê bisekinê û wê heta ku wê pênc birhanîn xwe wê di wê çerçoveyê de wê weke nîşanaka hebûna wî wê bide nîşandin. Wê Platînos wê di dewama wî de wê, teoriya 'sidûrê' ku wê pêşbixê wê, di dewame wê de wê ew wê bikê ku wê bènê li ser ziman. Wê wê li ser hizrên platon wê bisekinê û wê şîrove bikê

Di wê warê de mirov dikarê rengê hizirkirina serdemên navîn bi felsefîkî wê ji aliyê olî ve wê li duyan beş bikê. Aliyekê wê weke Thomasê Auqinayî, Platînos, Îmamê Gazalî û hwd wê, tenê wê li ser hebûna xwûdê wê bihizirin û wê ev wê felsefeyê wê ji aliyekê ve wê dênina li alîkî li kêlekê. Wê heta ku wê bi şewayekê dîrekt û ankû îndirekt wê kirina felsefeyê jî wê weke 'gûnah' wê bibînin wê werênina li ser ziman. Lê yên weke hin filosofên demê ên herêmê ên weke Bavê henîfê dînwerî, Kûrê Sîna, Kurê Rûst û hwd wê, ev wê bi şewayekê di nava wê hewldanê de bin ku ew felsefeyê derxina li pêş. Di aslê xwe de wê, di wê warê de wê, ew wê, di wê warê de wê, di nava wê hizirkirinê de bin û wê di nava wê tahbê de bin ku ew bidina nîşandin ku mirov bi felsefeyê wê karibê xwe bigihênê li rastiyê. Her wusa wê, di wê warê de wê, di felsefeya serdemên navîn de wê, hizirkirina bi rengê "biaqil karîna xwe gihandina li rastiyê bi derfet a" û ankû 'ne bi derfeta ku mirov bi aqil hemû tiştî fahmbikê" wê, di wê warê de wê, weke aliyna ku wê zêdeyî wê, li ser wê were hizirkirin bê. Gotina 'rastteqênîyê' wê di warê de wê bi du wateyan wê hertimî wê were nîqaşkirin û li wê hizirkirin. Yek wê bi wateya karîna xwe gihandina rastiyê û temenê tekoşîneka bi aqil bê. Ya din jî wê, bi rengê weke rastteqînî ne bi aqil lê bi bawerî û ibedetê ku mirov tenê dikarê xwe bigihênîyê de ku wê bê hanîn li ser ziman bê.

Di wê rengê û awayê de wê mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê felsefeya serdemên navîn wê, di wê warê de wê, bi zêdeyî wê bi awayekê ekolî weke bi navê 'felsefeya zerdeştîyê', Felsefeya ola Manî', 'felsefeya xiristiyanîyê'. 'felsefeya islamê', 'felsefeya cihutiyê' û hwd wê bi wan rengan wê êdfî wê were li ser ziman. Ev gotin wê weke gotinna ku wê bi hazaran salan wê bi hizirkirina li ser wan re wê ku wê hewlbêdayin ku wê temenê wan bi civakî, olî, dîrokî, felsefîkî û hwd ku wê were tiştî kirin bi hanîna li ser ziman. Felsefe wê, di wê rengê de wê weke aliyekê giring wê, di serî de wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ev gotin wê weke gotinna ku ew di çerçoveya pêşketina pêşketina serdemên navîn de hinekî jî li ser wan were sekin in û werina fahmkiirn bin.

1. Felsefeya Mîtratiyê wê weke felsefeyek olî a li herêmê ku wê berî serdemên kevnera wê li herêmê wê pêşkeve û wê hebûn û bandûra wê bi pêşketinên wê re wê heta demên dawî ê serdemên kevnera û demên destpêkê ên serdema navîn jî wê were. Wê Abgaarî wê mîtrayî bin Wê hêzên ku wê werina herêmê weke roma û hwd wê, dibin bandûra wê de wê bijîn û wê ji wê gelek tiştan wê bi felsefîkî û olî wê bigirin. Wê bandûra mîtrayîyan wê di serdemên navîn de jî wê bi rêya olên olên pêşdikevin ên weke mesihîyê wê xwe bide domandin. Wê di serdemên navîn de wê di demên destpêkê de wê pirr zêde wê li ser bandûra Mîtrayîyê li mesihîyê wê were sekin in û wê nîqaş jî wê bibin.

2. Felsefeya zerdeştîyê wê weke felsefeyek olî a demên serdemên kevnera bê. Wê li dora sedasale 7' min û pê de wê pêşkeve li herêmê. Wê gelek civakên ku wê bi wê bawerîyê wê bijîn wê pêşkevin. Wê, di rengê de wê, li ser milanyumekê re wê, serdema Zerdeştîyê wê li giştîya herêmê ku wê kurdistan wê navenda pêşketina wê bê wê xwe bide dîyarkirin.

3. Felsefeya Manî wê li herêmê wê weke felsefeyek bi heman rengê wê, di serdemên kevnera de wê li herêmê wê pêşkeve. Wê di dewama ya Zerdeştîyê de wê pêşkeve. Wê bi rêya Manîyê wê xate olî a yazdaniyê ku wê ji Mîtratiyê wê heta wê demê wê bijî wê xwe bide domandin. Manî wê, hem oldar û hem jî felsefevanek bê weke Zerdeşt. Wê rewşê de wê, kevneşopîya oldar-filosof wê, di wê çerçoveyê de wê ji aliyekê ve wê temenê wê biavêjin bin.

4. Felsefeya cihutiya wê weke felsefeyek kevn a berî demên kevnera ku wê li herêmê wê weke têtîneka olî ku wê ji olên kevn ên herêmê wê biafirê bê. Wê di wê rewşê de wê bandûra Zerdeştîyê wê di derketina wê de wê weyndar bê. Wê, piştî wê, heta serdemên kevnera wê, di xatekê ne zêde xort de wê xwe bide domandin. Lê gelek filosof û zaneyên ji wê xatê ku wê derkevin û wê demên xwe bi bandûr bikin wê derkevin. Wê, bê yek ji wan xate olî û felsefîkî a ku wê di serdemên navîn de jî wê di temenê pêşketina herêmê de wê xwe bide nîşandin.

5. Felsefeya xiristîyanetê wê weke felsefeyek ku wê piştî serdemên kevnera wê bi derketina Îsa re wê derkeve û wê xwe bide dîyarkirin. Wê di bawermendên wê ola nû wê li herêmê di nava olên kurdistanî û mesopotamîkî ên weke zerdeştî, manîyî, abgaarî û ankûş Mîtrayî û hwd de wê, xwe perwerde bikin û wê temenê xwe wê biafirênin. Wê piştî wê hin bi hin wê weke oleka ku wê pêşkeve wê pêşketinên herêmê wê di temen de wê cihê xwe wê bigirê. Wê hizrên demên kevnera wê bi wan

wê xwe biafirênê û werênê li ser ziman. Wê weke felsefeya xiristiyaniyetê wê ew wê, werina xwandin pêşxistin. Wê li ser wan re wê, hizirkirina xwe wê pêşbixê Wê, bi wê re wê zêdeyî wê piştî weke olek fermî ji aliyê Constanitinus weke keyê roma ve wê were pejiyendin êdî wê li herêmê wê pêşkeve û wê dêrên wê vebin û wê di wan de wê felsefeya demê were pêşxistin.

6.Felsefeya îslamê wê piştî sedsale 6' min û pê de wê derkeve li holê. Wê weke olek desthilatdarî wê bi kirina şoreşê re wê li herêmê wê pêşkeve û wê xwe bide dîyarkirin. Berî wê baweriyên olî ên li herêmê ên weke êzdayî, zerdeştî, Maniyî, Abgaarî û hwd wê bi gelek rengên din ên olî re wê, ji aliyê vê ola nû ku ew pêdikeve wê bê xistin bin pêvajoyên hêrişê de û wê bi wê re wê ew ji jîyanê wê werina tûnakirin û wê xwe bi wê li jîyanê wê, were bicihkirin. Wê weke oleka ku ew wê bi şûr wê pêşkeve jî wê, di dîrokê de wê were nasîn.

Bandûra van olan wê di serdemên navîn de wê, bi awayna cûda ên hizrî wê xwe bide dîyarkiirn. Wê di çerçoveyekê de wê manîyî û zerdeştî wê xwe bi rêya felsefeyê wê bidina bi temenkirin û wê karibin xwe bidina domandin. Wê çendî ku wê temenê wan ê jîyanî wê were tûnakirin û wê aligirên wan wê werina tûnakirn jî lê wê bifelsefîkî wê, bi felsefeyên ku wan xwe pêşxistina wê xwe bidina domandin. Felsefeya Maniyî wê, di wê warê de wê, piştî jî wê, weke di demên kevnera de wê bê wê di demên serdemên navîn de jî wê bi têtîngên weke dualismê û hwd re wê bandûra xwe wê bide nîşandin. Di aslê xwe de wê ev felsefe wê, hertimî wê bi wê têtînga xwe wê temenê realismekê bê. Wê, di wê warê de wê di serdemên kevnera de jî wê pêşketina di felsefeyê de realism wê di aslê xwe de wê bandûra hizrên zerdeştî û hwd wê, di wê de wê pîrr zêde wê kifşkar û weyna wan wê pîrr zêde wê mazin wê hebê.

Rengê pêşketina têtînga realismê wê di aslê xwe de wê weke aliyekê ku wê heta ku wê bi felsefeyî wê were serdemên navîn wê bi awayekê têrzanîn wê xwe bide dîyarkirin. Di serdemên kevnera de wê şewayê pêşketina têtînga realismê û rengê wê bi hizrên weke yên Platon, Aristo û Parmenides re wê, ji aliyekê ve wê were dîtin. Wê, di wê rengê de wê xwe bide dîyarkirin. Ji aliyê felsefîkî ve wê, hizrên Pythagoras ên felsefîkî bi rengê ku ew dihizirê wê, di aslê xwe de wê karibê têtîngê wê bide me. Hizrên Pythagoras ên di dibistana kroton de ku wê pêşbixê wê di awayekê de wê, ji zêhnê mirov cûda û serbixwe ku wê, hizirkiirna li rastiyê wê, weke aliyekê têtînga wê bê. Di wê rengê de wê, di serî de

wê, weke aliyekê wê fahmkirina wê jî wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman.

Di destpêka serdemên kevnere de wê di nava hizrên Zerdeşt de wê dema ku mirov di avêsta de dixwênê mirov di wê de dibînê, Dualisma Zerdeşt ku ew dihênê li ser ziman wê li ser esasê fahmkirina gîyane baş û ya nebaş ku ew şîrovedikê wê weke nûqtetek li ser wan re wê biserê xwe wê bênê li ser ziman. Di rengê fahmkiirna Zerdeştîyê a realismê de wê mirov dikarê wê werênê li ser ziman wê bi wê rengê wê were dîtî ku wê gîyanek xirab Ahrîmanû ankû 'Angra-mainyu' wê hebê. Li vajî wê, gîyanek baş bi navê Ahûra mazda û ankû 'spanta-mainyu wê hebê. Ev herdû wê weke du aliyên başî û nebaşî wê werina dîtî û wê heta ku wê jîyan hebê wê li hemberî hevdu wê hebin. Lê di nava wan de wê ya ku wê temenê ahenge û ankû 'belansê' wê çêbikê wê zerwan ku wê di avêsta de wê weke bavê herdûyan jî wê were dîtî û weke navê dem û gerdûnê wê were pênasekiirn jî wê were dîtî. Di wê rewşê de wê duîtîya ahrîman û ahûra-mazda wê di bin tekîti û ankû yekîtiya Zerwan de wê hebê. Wê Zerwan wê di mantiqê wê de wê, weke çerçoveyek yekîtiyê a destpêkê wê werê li ser ziman. Di wê çerçoveyê de wê ew weke rastiyekek bi serê xwe ku ew heya wê mirov dikarê wê fahmbikê û wê werênê li sr ziman. Di dewama wê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman wê Zerwan wê, bi hebûn û fahmkirina xwe re wê, weke çerçoveyek têtîni a fahmkirina realismê a di fahmkirina Zerdeştîyê de jî wê were dîtî û ser ziman.

Di heman rengê de wê di serdemên kevnere ên felsefeyê de wê tekîtiya Parmanides wê ji wê aliyê ve wê weke bi têtînek realist jî wê bi wê rengê wê were xwandin. Di wê çerçoveyê de wê relism wê bi fahmkirina xwe re wê çerçoveyek fahmkirinê a giştî û sereka mirov wê dikarê wê di wê rengê de wê hilde li dest wê fahmbikê.

Di wê rengê û awayê de wê, di serî de wê, weke aliyekê din jî wê mirov dikarê wê bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê, minaq wê, di rewşa çêkirina wêneyekê mirov dikarê wê bi wê werênê li ser ziman. Platon wê li ser naqşkirina wêneyê wê bêjê ku 'wêna ku ew hatiya naqşkirin wê, bi îdea xweşikatiyê wê were li ser ziman. Lê bi demê re wê ew wê wêna wê ji holê rabê. Wê tenê wê ew îdea wê ya xweşikatiyê wê bimênê, îdea xweşikatiyê wê her timî wê xweşik bê. Wê bi wê rengê wê ew wê werênê li ser ziman.

Epistemolojikê realism wê, hebûna tiştê wê weke dervê zêhnê me ku ew heya wê, bi wê re wê bihizirê wê werênê li ser ziman. Têtîni 'xwe

bixwe', 'tišta bi serê xwe', bi serê xwe', 'rastiya ji xwe re' hwd wê, weke têngîna ku mirov li vir di wê çerçoveyê de wan dikarin werênina li ser ziman bin. Li çînê Konfuçyusî û dibistana elea wê, di wê warê de wê, bi awayekê wê, hizirkirina wê, li ser wê bisekinê.

Realism û ankû rastî wê, di aslê xwe de wê, weke têngîneka ku wê di wê warê de wê, di serdemên navîn de jî wê, li ser gotinê û hebûna tiştê re wê bê mijare gengêşî û rewşên fahmkirinê ên ji hevdû cûda. Di wê warê de wê, di serî de wê, weke aliyekê giring wê di serî de wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, filosofên olî ên weke Anselmus wê di sedsale 11 min de wê bijî û wê ji hizrên Augustinus wê temenê xwe yê felsefîkî wê bikê çekirin. Gotina Augustinus a bi rengê "bo fahmkirinê bawer dikim" wê, hilde li dest û wê li ser wê re wê, bi rengê hizirkiirna xwe re wê bikê ku wê bi awayekê "bo bawerkirinê, dixwezim ku ez fahmbikim" wê, bènê li ser ziman. Di wê rengê de wê gotinên Anselmus wê, di wê rengê de wê hewlbide ku bîaqil baweriyê fahmbikê. Wê di wê rewşê wê təkiliya bawerî û aqil wê bikê ku wê, fahmbikê. Di wê rewşê de wê, bi hizrên wî re wê, dem bi dem wê di demên serdemên navîn de wê, weke kesekê ku wî ber aqil di baweriyê de xwestiyê ku wê derxê li pêş wê weke bi hizrên xwe re wê, di wê çerçoveyê de wê, bi awayekê realistî jî wê xwestin ku ew werê hanîn li ser ziman.

Di çerçoveya hizirkirina fahmkirinê de wê, di wê demê de wê, zêdeyî wê fahmkirina bi navê 'xwûdê' re wê derkeve li pêş. Anselmus wê bi wê jî wê hizrên xwe wê werênê li ser ziman wê bêjê ku "dema ku mirov bêjê xwûdê nîn a' wê kêmbimênê. Wê dema ku mirov bêjê heya wê hingê tam bibê û tambûn wê heyîna hebûna xwûdê wê bènê ser ziman." Di wê rengê de wê, ew wê hizrên xwe wê, bènê li ser ziman.

Serdemên navîn wê weke demna ku wê di wan de wê bi zêdeyî wê navê xwûdê wê derkeve li pêş û serwer bibê bê. Wê, bi wê re wê, were dîtî ku wê, felsefe wê, were xistin xismetê pêşxistina serwerîya xwûdê de.

Ji aliyekê felsefîkî ve ku mirov bihizirê mirov wê dikarê wê bêjê ku wê di serdemên navîn de wê, têngîna realismê wê, weke têngînek serwerî wê bi rengê pêşketina wê re wê xwe bide dîyarkirin. Hebûna xwûdê wê weke bi reng û navê "xwûdê yek a" re wê, ew wê, were dîtî. Di aslê xwe de wê, di çerçoveyek giştî de wê, di ahengekê de wê. Pêşketinek demkî wê bi wê re wê, were dîtî.

Felsefeya serdemên navîn wê, dema ku mirov li wê dihizirê wê dibînê ku wê di wê de wê, felsefe wê, weke têngîneka ku wê, mirov wê, dibînê ku

wê ji aliyê ontolojikî û epistemollojikê ve wê, giringîya xwe de wê, weke ya demên kevnera wê, bide nîşandin. Di wê demê de wê, hebûna felsefe wê, bo vegotin, salixkirin, watelêkirin, fahmkirin, bi hişkirin, têgihîştin û hwd re wê, were bikarhanîn. Di wê warê de wê zimanekê wê yê teybet wê hebê. Di aslê xwe de wê, felsefe weke aliyekê ku mirov wê, di wê warê de wê bi teybetî wê, dikarê wê, pêşketina wê ya di serdemên hemdem de wê, bi fahmkirina xwûdê û ankû 'gîyane pîroz' re wê, hilde li dest. Lê felsefe wê, di wê demê de wê, çendî ku wê were kirin û wê bi wê tenê wê di awayekê bênakok de wê hewldana hanîna li ser ziman wê were kirin û wê bêxistin xismet, bawerî û fahmkirina olê de wê, di wê rengê de wê, felsefe dîsa wê bi temenekê ku ew berê ew pêşketîya wê bi wê re wê, were dîtin.

Felsefe em çendî ku wê, bi gotina ahengî di serdemên navîn de wê werênina li ser ziman jî wê, bi felsefikî wê, çendî û çawa jî ku ew hat pêşxistin wê, dîsa wê di wê warê de wê, weynekê wê bileyizê. Di wê de gûhartina armancê û rengê fahmkirinê wê, di aslê xwe de wê, felsefeyê wê bi tememî wê nikaribê ji holê rabikê. Di serdemên navîn de wê, dema ku wê dem wê were dema serdemên navîn a dawî de wê, di wê de wê gûharînên bi hizirkî ku wê pêşkevin û temenê hizirkirinê ê bo lêpirsînê ku wê pêşkeve wê, bi wê bi me bide gotin ku "wê, çendî k uew têrzanîn û gihiştin bû wê, ew pêşketin wê were û bijî. Wê dema ku wê fêkiyek jî ku ew bi darê ve hati û bûtî heta ku ew negihjê wê, newê xwarin. Yan jî wê ji dara wê newê kirin. Wê, di rewşa felsefeyê û bi teybetî felsefeya serdemên navîn de wê, ev şibandin wê, di aslê xwe de wê, giringiyekê wê bi xwe re wê, bi pêşketina xwe re wê bide dîyarkirin.

Di pêşketina aqil û zanînê de wê, çendî û bi çi rengê ku ew pêşkeve jî wê, mirov dikarê wê di dewama wê de wê bêjê wê, têrbûn ku bû û piştre wê, encamên ku wê bide wê hertimî wê ji ya ku ew dihê tefkîrkirin û hizirkirin wê cûdatir bê. Di wê warê de pêşdîtina encamê wê, di aslê xwe de wê, ne weke rewşek bi awayekê teqez a dîyarker bê.

Di wê rewşê de wê mirov dikarê wê. Werênê li ser ziman ku wê rewşa aqil wê, weke rewşeka ku mirov dikarê wê bi şibihênê li civa yê. Civa ku ew çendî ku ew hat xistin tiştek wê hertimî wê, temenekê pîrr hesan wê bide. Lê di her demê de wê temenê wê hebê ku ew bê û bikeve her reng û awayê de. Wê, temenê gûharînê wê, di wê de wê, bi wê rengê wê hebê. Têkiliya nava gotin û wateyê wê, di wê warê de ku mirov carna ne di farqê de jî bê wê, bi xwe re wê, gûharînên giring wê karibê bide çêkirin. Di serdemên navîn de wê, ziman wê, bi awayekê pîrr zêde wê pêşkeve.

Wê di bereye firehîya têgihîştin û hişmendiyê de wê, felsefe wê temenê ku wê çêkiriya wê, bi wê re wê, şaqên din ên hizirkirinê ên weke wêjeyê û hwd wê, pêşbixê Di serdemên navîn de wê 'wêjeya oli' ku wê bahsa pêşketina wê were kirin wê, di aslê xwe de wê, weke aliyekê ku mirov wê dikarê wê di serî de wê fahmbikê bê. Wêja wê, di wê warê de wê aliyekê hizirkirinê û gûharîner wê bi xwe re wê biafirênê.

Di aslê xwe de wê, çendî ku wê bo demên duyem a serdemên navîn wê bahsa skolastikê wê were kiirn jî lê wê dema ku mirov wê li wê binerê bi zimanî û hwd wê, mirov dibînê ku wê, ji gelek aliyan ve wê, gûharînen mazin ku ew dibin wê, di wê warê de wê, serdemên navîn wê ji gelek aliyan ve wê, weke demna bi aqil pêşdikevin wê wê bide nîşandin.

Di nava dema serdemên kevnera û ya piştî demên serdemên navîn a serdema hemdem a piştî demên ronansansê wê dema serdemên navîn bixwe bê. Di wê çerçoveyê de wê weke temenekê afrîner jî bê ji wê re. Pêşketinên hizrî ên ku wê piştî wê bibin wê, di aslê xwe de wê, demên serdemên navîn wê, bo demên heemdem ên piştî ronansansê wê giringtir wê bide nîşandin. Di wê warê de mirov tenê wê bêjê weke 'demek tarî' û wê dema ku mirov wê şîrovebikê û bi tariyekê wê werênê li ser ziman wê, ne têr vegotinbar bê.

Di ti demê de wê dema ku wê jidandin wê bibê wê di wê de wê rehetî nebê. Wê di wê rewşê de wê, di serdemên navîn de wê, bi nerînê re wê zêdeyî wê jidandin wê bibê. Wê armanca navaroka felsefeyê wê were gûharandin. Wê wekî din wê têgînên weke yên gûmanê wê ji nava felsefeyê wê werina derxistin. Lê wê di serdemên navîn de wê di felsefeya wê de wê pîrr zêde wê, realism, mantiq û metafizik wê pêşxistina wan wê bibê. Ji aliyekê ve wê, metafizik wê, pêşketinên bi wê re wê weyn û rola têgîna gûmanê a j inava felsefeyê hatî derxistin ku wê hinekî dereng jî bê wê bileyizê. Minaq piştî wê, filosofên weke spinozê ku wê bi zimanê xwe yê xas wê, şîroveyên xwe wê bi têgînên weke rewîstê wê werênina li ser ziman wê hinekî jî wê nîşanaka wê bê. Spinoza wê di roja me de wê, hê li gorî rastiya wî ew bi tememî ne hatîya bê fahmkirin. Di wê çerçoveyê de wê mirov dikarê Bo filosofê demê Manî jî ku wê di destpêka dema kevnera de wê were û wê felsefeya wî, di demên serdemên navîn de wê zêdetirî wê bi hebûn û bandûra wê re wê were dîtin wê, heman tiştê mirov dikarê bo wî jî wê werênê li ser ziman.

Felsefeya mantiqê wê, di aslê xwe de wê, weke aliyekê giring bê ku mirov wê, di serî de wê, di çerçoveya demê de wê, weke aliyekê bingihînî bi têgînek realist wê hilde li dest bê. Wê, di dewama wê de wê,



di vegotinên ku wê bi olzanîyî wê werina kirin û pêşxistin wê, di aslê xwe de wê, di wê rengê û awayê de wê, weke di wan de jî wê, bi heman rengê wê, temenekê wan ê realist û mantiqî û hevgirtî wê hebê. Şîroveyên Dantê ku wê di berhemên xwe yên weke «komîdiya ilahî» bikê wê, di aslê xwe de wê, di wê warê de wê têgînekê wê karibê hem bi navê û hem jî bi navaroka wê bide me. Weke wî wê dema ku mirov dem bi dem wê demên wê navaroka serdema navîn wê dinerin mirov rastî wê, dihê. Ji aliyê nav ve wê minaq wê, têgînên weke 'rûhanî', 'pîrozî', 'bawerî' û hwd wê zêdeyî wê derkevina li pêş û wê serwer bibin. Li pêşya navan jî wê minaq wê bahsa Augustinus wê were kirin wê, gotinên weke 'aziz» û hwd wê werina bi karhanîn.

Xosletên pêşketina felsefeya serdemên navîn wê, di wê rengê de wê, bi awayekê wê, li şûna ontolojiya metafizikê wê olzaniya metafizîkî wê, werênê. Di wê wê warê de wê, bi felsefeyê wê, êdî wê bikê ku wê pêşbixê. Wê, bi wê pêşxistinê re wê, şîroveyê wê li ser jîyanê re wê, bi hebûna 'hebûnek teqez' re wê, werênê li ser ziman. Wê, bûjanê wê, di nava fahmkirina kirdeyî û ankû manawî de wê bide windakirin. Wê, li ser wê re wê, hizirkirina wê were kirin. Weke ku mirov wê dibînê wê, di aslê xwe de wê, weke aliyekê giring wê weke ku wê, bi gotinan wê, bi wateyî wê di awayekê 'objeyî' de wê hizirkirineka objeyî li şûna hebûna bûjenî a di jîyanê de ku wê bi hizirê wê, bi wê re wê were dîtîn. Di wê rengê de wê, di serî de wê, ew wê bi wê re wê, were dîtîn ku wê, felsefe wê, di awayekê 'hevgirtî' bi hevdû re ne bi nakok wê di awayekê de wê, were hanîn li ser ziman. Xosletê sereka wê ew bê ku wê, tahamulê ji gûmankirinê re wê di wê demê de wê nebê. Wê bawerî û aqil wê, di wê warê de wê, çawa wê hevdû herêbikin û ankû çawa dikarin hevdû herêbikin û bi hevdû werina fahmkirin wê weke aliyekê hizirkirinê wê, di aslê xwe de wê, li wê were hizirkirin. Di wê rewşê de hewldanên têkiliyekê di nava aqil û bawerîyê de çêkirin wê bi wê re wê, weke aliyekê giring wê were dîtîn. Lê di wê warê de wê filosofên ku wê aqil û baweriyê li hemberî hevdû jî wê bibînin û wê fahmbikin wê hebin. Minaq **Williamê Ackhamî** wê, di warê bawerî û aqil de wê bêjê ku «bawerî û aqil ji hevdû ji hevdû cûda na, du qadên ji hev cûda na.» Wê bi wê gotinê wê di demê de wê, mudahaleya aqila li bawerîyê û ya baweriyê li aqil rast ne dî dît û li dijî sekinî bû. Wê di wê rewşê de wê weke ku mirov dibînê wê çendî ku wê bawerî wê derkeve li pêş jî lê wê, têkiliya nava bawerîyê û aqil wê, bê mijareka sergirtî û ankû servekirî ku wê were lêpirsîn jî bê di demên serdemên navîn de.

Di demên serdemên navîn de wê, zêdeyî wê, bi awayekê stêrzanî ê hemdem wê ji destpêka wê derkeve li pêş. Di wê warê de wê, rewşa serdemên navîn wê di aslê xwe de wê bi zêdeyî wê di awayekê teybet de wê xwe bide domandin. Di warê stêrzaniya serdemên navîn de ku mirov bihizirê wê, mirov dikarê wê bêjê ku wê bi awayekê aqadamîkî wê, mijar kê mî wê were dîtin ku wê were hildan li dest. Çend filosofên demê ên ku wê, aqilê xwe bi zêdeyî wê bidina ser mijarên weke Stêrzaniyê û hemdemîya wê û ku wê navê wan derkeve li pêş wê, Abraham kurê Ezra, kurê maymun, Isaac Abrabanel, Dawid kîmhî, Solomon kurê Gabirol, Saadia Gaon, Judah Halevi, BIrehimê Xelatî, Fexredinê Tusî, Bavê îsa, ismailê Cizîrî û hwd bin. Weke wan mirov dikarê gelek nava werênê li ser ziman.

Di wê warê de wê di serî de wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, rewşa aqil wê, di wê warê de wê, pirr zêdeyî wê derkeve li pêş. Stêrzanî wê, şêwayekê hizirkirinê ê ku wê di demê de wê, bi zêdeyî wê, ji dunyayê wê berê aqilê mirov wê bide derve jî bê. Wê, di wê rengê û awayê de wê, di serî de wê, ew wê, derkeve li pêş.

Di rewşa Stêrzaniyê de wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, li kurdistanê wê gelek filosofên ku wê derkevin di demê de wê dema ku mirov li nava berhemên wan dinerê wê, bi zêdeyî wê, têtîgînên ser stêrzaniyê ku wê bi zêdeyî wê pêşbixin wê werina dîtin. Li rojava filosofên olî ku wê derkevin wê, zêde wê ji aliyekê ve wê hertimî wê, stêrzaniyê wê ji xwe re wê bikina mijar. Di baweriyên demê de ku wê têtîgîna 'xwûde li azmana ya' wê bi zêdeyî wê heya mirov bi aqilê mirov re wê berê wê bide li azmana. Wê, di wê warê de wê, têtîgînên weke 'dojeh li bin ardê ya' û bihûşt li ser ardê li azmana ya' wê, di wê warê de wê, weke têtîgîneka demên kevnera a herêmê jî wê, di wê rengê de wê weke têtîgîneka ku wê rengê berê aqilê mirov û hizirkirina mirov jî wê bi xwe re wê bide nîşandin bê.

Di wê demê de wê, dema ku mirov wê li wê bihizirê wê, bi wê re wê, bizêdeyî wê, pirsek wê di demên hemdem de wê li ser serdemên navîn wê were kirin û wê bê pirsên ku wê piştî serdemên felsefeyê wê ber çî wê bi zêdeyî wê, ol wê bi zêdeyî wê pêşkeve û wê serdest bibê? Di aslê xwe de wê, dema ku mirov li rengê hizirkirinê demê binerê wê çendî ku wê felsefeyna bi pêşketî wê derkevina li pêş jî lê wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, di rewşa hizirkirinê û gelemperîya wê, her wusa hewldana şîrovekirina her tiştê û elementên ku ew di nava felsefeyê de ku ew hatina pêşxistin wê, di serî de wê, bandûra wê hebê. Lê ev wê

ne têr bê ku mirov bi wê karibê wê bi tememî fahmbikê. Di serî de wê, weke aliyekê din wê mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê rewşa aqil wê, di wê rewşê de wê, bi zêdeyî wê, di gelemperîya wê de wê, nûbûnek wê di aslê xwe de wê, di nava pêşketina olî de wê xwe bide dîyarkirin. Ew jî wê, rewşa jîyane civakî û ku wê ew wê weke sazûmanaka wê xwe bide dîyarkirin û pêşxistin bê. Di wê rewşê de wê, pêşketina destpêka civakatîyên demî jî wê, di wê rewşê de wê hebê. Wê, di wê rewşê de wê, ev pêşketin wê, mihtacê serwerîyek giştî bin. Wê, di wê rengê de wê, ev wê bi zêdeyî wê derkevina li pêş. Lê wê bi wê re wê, weke aliyekê din jî wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê rewşa wê, di serî de wê, bi zêdeyî wê, xwe bi şûnpêya hizirkirinê a demên berê ku wê di nava felsefeyê de wê xwe bide domandin wê bi wê re wê, werênê li ser ziman wê, bandûra wê zêde hebê. Wekî din wê ol wê, bi tememî wê bi felsefeyê wê bidest hizirkirinê wê bikin. Ev wê weke aliyê herî giring ê ku mirov dikarê wê, di serî de wê di temen de wê fahmbikê bê. Di wê rengê de wê, çendî ku wê, ol wê weke ku bi serdemên navîn re wê, weke 'dawîya demên felsefeyê' jî wê were dîtin lê wê di aslê xwe de wê, weke rewşa denezendina bi aqilê felsefeyê oldariyê û pêşketina wê ya bi jîyane civakê re bê. Wê, di serî de wê, weke aliyekê giring wê, di serî de wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman bê.

Felsefe wê, di wê rewşê de wê, di serdemên navîn de wê, bi awayekê teybet wê, di aslê xwe de wê, serdemekê wê di wê rengê de wê bi rêya olê re wê bijî. Wê bi xosletên wê yên demkî re wê were bi rêxistin kirin. Wê, wê demê de ê hizirkirina hemdem a felsefî wê weke temenê fahmkirina olî wê were dîtin. Nivîsandina dîroka olzaniyê wê, di wê warê de wê, weke aliyekê olî ê ku wê temenê serwerîya wê biafirênê. Li kurdistanê kesên weke bavê şedad, Aliyê Êsîr û ankû bavê êsîr û hwd wê weke wan wê bi dehan filosofên demê wê derkevin û wê li herêma wê hizrên xwe wê, di wê rengê û awayê de wê werênina li ser ziman. Di wê rewşê de wê, di serî de wê, weke aliyekê giring wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, li kurdistanê wê, di felsefeya demê de wê, du xat wê, bi awayekê wê were dîtin. Wê, aliyekê wê, weke Gazalî û hwd wê, bi zêdeyî wê, bawerîyê wê derxina li pêşîya aqil bê. Lê yên weke Kûrê Rûst, Kûrê Sîna, Amîdî, Emerê Suhrewerdî û hwd wê, derkevina li pêş. Di wê rewşê de wê, ev di rengê hizirkirinê de wê biaqil wê, di dîmenê de wê ontolojiya metafizîkê wê derxina li pêşîya ya olzaniyê. Di wê rewşê de wê, bi aqilê xwe re wê, di demê de wê bi zêdeyî jî wê,

bandûra wan wê hebê û wê, di dema xwe de wê bi aqilê xwe de wê weynek mazin jî wê bileyizin.

Di wê rewşê de wê, di serî de wê, weke aliyekê giring wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, felsefeya demên navîn wê, di wê rengê de wê, di awayekê de wê, di demên serdemên navîn ên destpêkê de wê, bi zêdeyî wê, felsefeya metafîzîkê wê di wê de wê, were pêşxistin. Wê di wê rengê de wê, hizirkirinek wê, bi aqil re wê hewl bêdayîn ku ew were pêşxistin bê. Çendî ku wê metafîzîk wê ji rengê hizirkirina wê, ne bi zanyarî wê bihizirê jî lê wê di çerçoveya pêşketina demê de wê, mirov dikarê weke pêşketineka aqilî a pêşketî jî wê di nava dîmenê giştî ê serdema navîn de wê fahmbikê.

Di aslê xwe de wê, li rojava û ankû li ewropa ku wê navende wê dêr bê wê hin bi hin wê filosofên olî wê deerkevin. Wê, di wê warê de wê, hizrên xwe wê, bi olî wê, werênina li ser ziman. Wê ew jî wê, têkiliya aqil û olê, aqil û baweriyê, bawerî û mirov û hwd wê bi gelek aliyên din re wê, bixwezin ku wê fahmbikin û li ser wan hizrên xwe werênina li ser ziman. Ew hanînen li ser ziman wê, çendî ku wê zêdebibin wê bi demê re wê bina temenê hizirkirin û fahmkirin ji hevdû cûda jî. Wê dema ku wê fahmkirinêmn cûda wê, pêşkevin wê, di aslê xwe de wê hingî wê ahenge fahmkirinê a hevgerî ku wê bi olê di serdemên navîn de wê bê xwestin ku ew were pêşxistin wê, ew wê hin bi hin wê weke ku wê, têkçûn wê di wê de wê bibê. Di wê rewşê de wê hizrên cûda wê hertimî wê, temenê nîqaşên li ser olê bixwe jî wê bi demê re wê biafirênin. Di wê rewşê de wê, di wê warê de wê, felsefe û ol wê, çendî wê weke du gotinên ku ew hevdû fahmbikin û biişin wê di aslê xwe de wê, weke aliyekê din ê fahmkirinê bê. Di wê rengê de wê, mirov dikarê wê bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê, felsefe wê, çendî ku wê, xosletê wê yê gûmanê û lêpîrsînê wê ji wê were derxistin jî lê felsefe wê bi xosletê xwe yê fahmkirinê wê, hin bi hin wê, karibê di mejî de wê, xwe bigihêne têgînekê li ser giştîya olê re di demê de. Wê vê jî wê, bi demê re wê, bi hizirkirinên rexnegir ên demê re wê wê bikê. Felsefe û ol wê, hertimî wê, bi hevdû re wê, weke ku wê were xwestin wê nemeşe, her çendî ku wê bê gotin ku felsefe û olê bi hevdû re wê di demê de wê levkirinekê jî wê bi hevdû re wê bidina çêkirin jî. Wê nîşanekên wê jî wê, hin bi hin wê bi aqilên lêpîrsîner ku wê bi demê re wê pêşkevin re wê xwe bide dîyarkirin. Me li jor got wê dema serdema navîn wê di wê de wê, weke aliyekê wê dîtbar ê bi aqil û pêşketina wê bi zêdeyî wê, stêrzanî wê xwe bide dîyarkirin. Stêrzanî wê, di aslê xwe de wê, weke nûqteya ku wê hin

bi hin wê temenê lêpîrsînê wê bi xwe re wê bide çêkirin jî bê. Minaq stêrzanên weke kapler, kopernîk, galilei û hwd wê, ku mirov li wan hizrên û kirinên wan binerê wê di wê warê de wê, bi zêdeyî wê ew lêpîrsîn wê xwe bide dîyarkirin. Minaq wê, hizrên gellilei ên di derbarê gerwêrkên di dervî dunyayê de ku wê bînen ser ziman wê, dem bi dem wê, bê sedema ku ew bi dêrê re were hemberî hevdu. Tê gotin ku wî dem bi dem hizrên xwe bi şûn dana kişandin tevî ku wî bi wan bawer jî dikir. Wê, di wê rengê de wê, ev rewş wê, ne tenê wê bi wî re wê hebê. Wê li deverên din ên cihanê û bi baweriyên din re jî wê xwe bide dîyarkirin.

Di aslê xwe de wê stêrzanî wê bê temenê şoreşkirina li ser serdema navîn re jî bê. Di wê rengê de wê, di serî de wê weke aliyekê giring wê mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Di serî de wê mirov dikarê wê bêjê ku wê, di wê warê de wê, bi hizirkirinê wê, hizrên stêrzanîyê û bi demê re wê nivîsandinên bi rengên din ên weke bi wêjeyî û hwd ku wê pêşkevin wê, ew jî wê, weke aliyna din ên ku mirov wê, di wê warê de wê, di serî de wê, weke temenê gûharînên ku wê bi demê re wê werin û bibin jî werênê li ser ziman bê.

Di serdemên navîn de wê hizrên gelek filosofên serdemên kevnera ên weke sokrat, platon, Aristo û hwd wê, werina xwandin û wê li ser wan re wê têgînên daerêjkê û fahmkirinê wê werina temenkirin di fahmkirinê de. Wê, di wê rengê de wê, dema ku wê, galilei wê ji quleya pîsa'yê wê tişt wê biavêjê xwerê bo ew fizika aristo bi ceribênê wê, di aslê xwe de wê, weke rewşeka ku mirov dikarê wê di wê çerçoveyê de wê, di serî de wê, werênê li ser ziman bê.

Fahmkirina serdemên navîn tenê bi aliyê wê dîtbarî ê derketina li pêş a olê re wê fahmkirina wê, di aslê xwe de wê weke aliyekê kêf fahmkirinê bê. Ol bixwe jî wê dema ku wê di wê demê de wê were fahmkirin wê, di çerçoveyek rast de wê hê jî wê kêf hatibê fahmkirinê bê. Di serî de wê, weke aliyekê wê yê giring wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman.

Weke elementên pêşxistina aqilê serdemên navîn navên felsefîkî û hizrî mirov dikarê bi çend sernavan wan werênê li ser ziman. Di serî de wê felsefeya cihutiye wê weke aliyekê giring wê xwe bie dîyarkirin. Aliyê din wê felsefeya kurdistanê wê, mirov dibînen ku wê weynekirî zêde wê li herêmê wê bileyîzê. Li ewropa û pêşketina wê ya bi felsefeya xiristiyanîyê re wê di serî de wê weke aliyekê giring wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman, Piştê derketina li holê a îslamê wê, di destpêkê de wê weke ku mirov wê dibînen wê ser felsefeya cihû û ya kurd re ku wê ji wam sûdbigirê wê pêşkeve.

Di serdemên navên de felsefeya kurd wê, heta roja me wê çendî ku wê weke aliyekê ji temen ve xwediyê kifşkariyekê jî lê wê zêde wê li ser wê newê sekin in. Di wê warê de wê, di serî de wê, dema ku mirov mirov di pêşketina îslamê de jî wê li wê binerê wê, bandûra wê xwe bide dîyarkirin. Filosofên kurd ên weke Weysel qaranî, bavê hanîfê dinwerî û hwd wê weke wan bi dehan filosofên demê wê derkevin. Di wê warê de wê felsefeya kurd wê di aslê xwe de wê mirov dikarê di çerçoveya demên hemdem de wê, kevnera û piştire ya serdema navîn de wê li du deman li hevdû hevdû beşbikê û wê werênê li ser ziman. Di wê rengê de wê, di serî de wê, karibê wê di serî de wê, were fahmkirin. Felsefeya kurd wê, di serdemên kevnera de wê, bi awayekê sazûmamî wê xwe di serdemên kevnera de wê, weke demên olî ên serdemên navîn wê di serdemên kevnera de wê bi hizrên Mîtra û piştire Zerdeşt re wê xwe bi çeroveyek giştî wê bi çerçoveya olî a êzdayî û ankû yazdanî re wê bide nîşandin. Wê, di wê rengê û awayê de wê, di serî de wê, ev wê weke aliyekê wê yê giring wê, xwe bide nîşandin. Felsefeya kurd wê, di wê warê de wê, di aslê xwe de wê, weke kelehe wê ya dawî a ku wê di wê rengê de wê pêşkeve û wê piştire jî wê weyna xwe wê bi hizrên xwe yên pêşxistî wê bileyizê wê, Manî û çerçoveya wî ya olî ku wî li ser wê temenê pêşxistîya bê. Di wê çerçoveyê de wê, di serî de wê weke aliyekê giring wê mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê li ser xate olên semewî ku wê çawa ji cihutiyê heta mesihiyê û îslamê wê li dûv hevdû wê were li ser ziman wê, bi heman rengê wê li kurdistanê wê di awayê xatek yekxwûdayî a yazdanî de wê bi ola mîtra, ola zerdeşt û ola manî wê di heman rengê û awayê de wê li ser xate yazdanî wê xwe bide dîyarkirin. Di wê rengê û awayê de wê, di serî de wê weke aliyekê giring wê mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê li kurdistanê wê xate yazdanî wê piştî hatina îslamê û pêvajoyên wê yên hêrîşkiirna li temenê wê ku wê were rûxandin wê piştire wê di nava civakê de wêbi komên civakê re wê xwe bide domandin. Komên civakî ên weke yarasanî, êzdayî û hwd mirov dikarê wê wê rengê û awayê de wan hilde li dest û werênê li ser ziman. Di heman rewşê de wê, di dewama wê de wê şêx Adî û sultan şahaq ku wê weke avakarê wê xatê ên demên serdema navîn de bin wê hizrên wan wê, bandûra xwe wê pîrr zêde wê li herêmê wê di çerçoveyê de wê bide nîşandin.

Lê li herêmê wê, di wê warê de wê, piştî derketina li holê a îslamê wê, li kurdistanê wê wergerîna li wê bibê û wê di wê de wê, bi wê asta xwe ya felsefeyî wê, di wê de wê, bi awayekê bi hêzî wê temenê xwe wê bi

zêdeyî wê biafirênê û serwer bibê. Di wê rewşê de wê, di aslê xwe de wê, felsefeya kurd ku ew heta ku ew bi rastiya wê re newê fahmkirin wê ne bi rastî wê herêm û demên wê yên kevnera û serdemên navîn wê baş werina fahmkirin û ne jî wê olên piştî hatina herêmê ên weke îslamê ku wê pêşkevin ne jî wê pêşketina wan wê bi awayekê rast wê di demên wan de wê baş wê werina fahmkirin. Di wê rengî û awayê de wê, di serî de wê weke aliyekê giring wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Ji nedîtî ve hatina felsefeya kurd di temenê wan pêşketinan de wê bi awayekê bizanebûnî bê û ne bi zanebûnî bê wê çavê xwe li rastiye girîntî û ji ne dîtî ve hatina wê bê. Di aslê xwe de wê, gelek pirsgirêkên ku wê piştî wê, derkevin û wê bina temenê tengezeriyên civakî, olî û hwd li herêmê wê hinekî jî wê ev di temenê wê de wê hebê.

Di serdemên navîn de wê, di aslê xwe de wê, dema ku wê li herêmê wê dem wê were li dora sedsale 14' min û pê de wê, li ber ronasansekê bê. Wê, herêm wê hema beşa wê bi zane û hizrên ku ew bi navê olê bê û ankû hizirkirinên din bin ku ew dihên pêşxistin wê hin bi hin wê bi lêpîrsînên hizirki re wê, pêşxistinên nû wê hin bi hin wê temenê wan wê biavêjê. Ya ku wê, ronasansa herêmê wê pêşîya wê bigirê wê, di aslê xwe de wê derketina li holê û serdestîya osmanî bê. Wê ev wê hemû deriyên pêşketinê ên li herêmê wê di wê demê de û di demên piştî de wê li herêmê wê bide girîntî. Di wê çerçoveyê de wê dema ku wê felsefe û hizir wê ji xwe re wê di wê rengê de wê rêya hanîna li ser ziman wê nebînê wê piştî wê, hin bi hin wê goçî rojava bikê. Wê ya ku wê, li rojava wê ji aliyekê ve jî wê bê temenê ronasanê û destpêka wê di aslê xwe de wê ev goça aqil jî bê. Di serî de wê weke aliyekê giring wê mirov dikarê wê, weke aliyekê giring wê werênê li ser ziman.

Di serdemên navîn de wê di wê demê de wê, hin bi hin wê li hizrên hevdu wê rexnegirîntî wê pêşkeve. Rexneyên filosofên demê ên li hevdu wê, hin bi hin wê bê temenê labitandinekê. Mînaq rexneyên Spinoza ên li bavê maymun wê mirov dikarê li vir mînaq bide. Wekî din hebûna gnostikan wê bi rexneyên xwe yên li pêşketinên olî ên demê ku wê bigirin mirov dikarê werênê li ser ziman. Wê berhemên gnostikan wê di wê demê de wê zêde wê ji xwe re wê mafê jîyanê wê nebin. Wê werina ji holê windakirin û ankû şawitandin. Ber ku wê weke ne li gorî bawerî û olê wê werina dîtî. Di wê rewşê de wê, di dêrê wê 'afaroz' kirin û ankû avêtina wan a ji dêrê wê, weke aliyekê ku wê pêşkeve bê. Mijarên weke levkirina bi hizra xiristîniyanîyê a olî re û ankû bi wê re ne çawa wê were levkirin wê ji aliyekê ve wê Athenagoras wê, di berhema xwe ya bi navê

”dilekçeya lutfê a ji xiristanan re” ku wê binivîsê wê di wê de wê li ser hizrên serdemên kevnera jî wê bisekinê û wê li dijî felsefeya serdemên kevnera wê nesekinê û wê li dijî wê newênê ser ziman. Lê li gorî wê çendî ku wê felsefeya serdemên kevnera wê weke aliyekê ku wê weke temenê wê karibê were hildan li dest bê lê wê hinek nûqteyên wê yên ku ew weke ‘levnakin’ ku ew dibîne jî wê li ser wê bisekinê. Di wê rewşê de wê, hizrên wî weke aliyekê ku wê di serdemên navîn de wê di nava olê de wê, rêya hizirkirina nava olê bi felsefeye serdemên kevnera jî wê bide vekirin.

Wê weke ku mirov wê di felsefeya Athenagoras de wê bibîne wê têgîna ‘wahiyê’ wê derkeve li pêş. Wê li gorî wê, ‘ya di derbarê xwûdê mirov divê ku ji xwûdê fêr bibê’ wê werênê li ser ziman. Di mantiqê de wê, bihizirê ku wê ligorî wî piştî bav gîyan pîroz zûhûr kiriya û dîsa li wî vegeerîya ya. Athenagoras wê bi şartê ku ew wahiyê li pêşbigirê wî aqil di temenê baweriyê de xwest bicih bikê û bi wê werênê ser ziman. Di wê rengê de wê, ev rengê hizirkirinê weke ku mirov bi wî re kifşdikê wê piştî wê zaneyên olî ên ku wê werina wê di berhemên wan wê bi wê rengê wê were ser ziman.

Augustinus ku wê di nava Manîyan de wê bi salan wê temenekê perwerdeyî ê olî wê bibîne wê, bo bawerkiirne fêrbûnê wê, werênê li ser ziman. Di wê rengê de wê, di aslê xwe de wê, baweriyê wê, di wê rengê de wê, weke aliyekê temen wê ji wê re wê aqil wê werênê li ser ziman. Di pêşketina felsefeya xiristiniyanîyê de wê mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê, bi zêdeyî wê, di wê warê de wê, ji aliyekê ve wê, aqil û ji aliyê din ve jî wê bawerî wê derkeve li pêş. Filosofên olî wê, di wê warê de wê, bi zêdeyî wê li ser çerçoveyek olî a ku wê herkesek wê ‘wekehevdû bi heman baweriyê’ wê bijî wê li ser wê bisekin. Klement wê di berhema xwe ya bi navê ‘pedagog’ de wê, li ser rewşa kesên ku ew di bûhûrîna li xiristiniyanîyê wê bisekinê. Wê di wê warê de wê, hizrên xwe wê li ser wê werênê li ser ziman. Di felsefeya Orîgenes de wê mirov dibîne ku wê, xiristiyani wê, çawa wê dîmenekê wê were dîtin. Wê, Origenes wê, di berhemên xwe wê, menewiyetê û ‘destûra pîroz’ wê bisekinê. Wê li ser wê re wê dema ku ew xitab dikê wê di nava gotinên xwe de wê ‘kesên bêbawer’, ‘kesên sapkin’ û hwd wê, di axiftinên xwe de wê li ser wan wê bisekinê. Di wê rengê de wê, di aslê xwe de wê, hizrên Origenes wê, di wê warê de wê, çendî ku wê ji aliyekê ve wê aqil wê derxina li pêş jî lê wê, ji aliyê din ve jî wê, weke hizirkirina hişk û ji hevdu cûdakirinê jî bin. Wê di derbarê hizra ‘teslîsê’ de wê zanîne xwe



wê werênê li ser ziman. Wê, logosê wê, bi gîyane pîroz û bav ve wê girêdayî bê. Wê, di wê rengê de wê, ew wê, dema ku wê bahsa xwûdê bikê wê bi gotina 'li deverê dervî bûjenê di xwezayê xwe de dijî' re wê werênê li ser ziman. Li gorî wî xwûdê bi rêya logosê ji tûnabûnê afirand'. Ev rengê hizirkirina Origenes wê, di aslê xwe de wê, di derbarê destpêka jîyanê û ankû hebûna bûjenê de ku wê di serdemên kevnera wê bi hizra 'tişt ji xwe heya' û ankû 'ji nebûnê dibê' û hwd wê, di rengê de wê, di serdemên navîn de wê, bi olê re wê were hizirkirin bê. Wê, di wê rewşê de wê hewldana fahmkiirî û hanîna li ser ziman destpêka jîyanê wê, di wê çerçoveyê de temenê bûyina tiştê wê bi wê re wê, weke aliyekê giring ê ku mirov wê dikarê wê, werênê li ser ziman bê. Li gorî wê logosa di hundirê bav de wê dizanê ku ew çi ya. Di wê çerçoveyê de wê, ji aliyekê ve wê rengê hizirkirina Origenes wê, bi warsiyoneka din wê bi têngîna tişt di xwe de ew bi xwe heya wê, mirov dikarê wê bi şewayekê hizirkirinê jî wê fahmbikê.

Ev hizrên ku wê hin bi hin wê bi wê rengê wê li dûv hevdû wê werina ser ziman wê temenê hizirkirinêmn felsefîkî ên felsefeya xiristîniyatê jî wê bi xwe re wê bi demê re wê, bi afirênê. Di wê rengê de wê, ew wê, hin bi hin wê bi awayekê felsefeyê ku wê bikeve nava hewldana fahmkirin û hanîna li ser ziman a hebûnê û ji wê jîyanê û ji jîyanê tiştê wê bi wê re wê, hanînên li ser ziman wê weke aliyê hizirkirî ên felsefîkî ku wê temenê lêpîrsînên di jîyanê ên bi aqîê wê biafirênin jî bin.

Di serdemên navîn de wê hewldana fahmkirina hebûnê û tiştê û bûyîna wê ji destpêkê wê, weke aliyekê felsefîkî ku wê hema bêja pîrîniya filosofên demê wê li ser wê serî biwastênin bin. Wê hewlbidin ku wê fahmbikin û wê werênina li ser ziman. Ev alî wê weke aliyekê giring ê ku wê ji wê felsefe serdemên navîn a hebûnê wê pêşketina xwe wê hin bi hin wê bide çêkirin û pêşxistin bê. Ev alî wê weke aliyekê ku em divê ku wê hinekî li vir di dewama mijarê de wê li ser ê bisekin bê.

Lê di demên destpêkê de wê, dema ku mirov li pêvajoyên pêşketina olê û bawermendên wê binerê wê, çendî ku wê ji aliyekê ve wê, felsefeyê wê, wê ji wê sûdbigirin jî lê wê yên ku wê bi tememî wê felsefeyê wê, dijberîyekê wê li dijî wê bidina nîşandin jî we hebin. Mînaq Ambrosius wê yek ji wan kesên ku wê, bi bi zimanekê dîj wê dijberîyê wê li felsefeyê wê bikê bê. Wê di wê rengê de wê hizrên wî, di wê rewşê de wê, bi navê dêrê wê li ser esasê monîsmekê wê werina dîtin. Di wê warê de wê, Tertulianûs wê weke oldar û filosofekê xiristîyani ji kartaca jî wê, dijberîya li felsefeyê wê zêdetirî wê pêşdetir wê bibê. Wê, ew wê, werênê

li ser ziman û wê bêjê ku wê mafê şîrovekirina bineterên nivîskî ên pîroz wê tenê mafê wê yê kesên bawermend wê bibînê wê, heta ku wê kesên weke gnostik û weke 'sapkin' ew dibînê wê bêjê ku wê 'mafê wan nîn a' ku ew wê bikin. Wê, di wê rewşê de wê, helbestek bi dîyar wê li dijî wan wê bide nîşandin. Tertulianûs wê pêdetir wê bibê û wê, weke dijberîya aqilperezîyê jî wê rewşê pêşbixê. Ambrosius wê, di dema xwe de wê, weke kesê bavê dêrê wê, di nava hewldana pêşîya filosofan û têkiliya wan bi dêrê jî wê bikê ku wê bigirê.

### **Pêvajoyên pêşketina bi ber dema skolastîkê ve û çavkaniyên wê**

Wê serdema navîn wê, di aslê xwe de wê, weke demeka ku wê di wê de wê felsefe wê, ku wê çavkaniya wê serdemên nacvîn bê wê bi zêdeyî wê pêşkeve û wê derkeve li pêş. Li vir di aslê xwe de wê mirov dikarê wê bêjê ku wê felsefeyên demên berê ên weke ya aristo, platon û hwd wê, bina weke temenna giring ên fahmkirinê. Wê, di wê çerçoveyê de wê, ev felsefe wê, weke aliyna ku wê bi wan wê aqil û bawerî wê, werê nîqaşkirin û wê hewlbêdayin ku ew werina fahmkirin bê. Demên berî demên skolastîkê wê weke demên patristisk ku wê ji demên piştî jîyane Îsa û pêde wê destpê bikin mirov dikarê li sê deman wê beş bikê. Dema pêşî wê navbera sedsale 1'în û 2'în bê. Wê, ev dem wê weke demeka ku wê di wê de wê hin bi hin wê bawerî wê were kifşkirin û wê hertimî wê weke têgîneka ku wê li ser aqil re wê hin bi hin wê were hanîn li ser ziman bê. Wê zane û filosofên olî ên wê demê ku ew derdikevina li pêş wê Aristeides, Justinus, Tatianus, Athenagoras, Îreneus, Tertullianus û hwd bin. Wê, ev wê weke kesna ku wê bi felsefeyê û baweriyê wê bikin ku wê fahmbikin bin. Wê ev wê di wê rengê de wê, weke demeka kifşkirina aqil û baweriyê a li rex hevdu jî bê. Wê li ser wê wê nîqaşên nava wan wê werina pêşxistin.

